Büro der irakischen Kurden in Bonn

Offic of the Iraqi Kurds in Bonn

Postfach 300112, 5300 Bonn 3 Fax (0228) 611679

Bangewazîyek

Ji Birowa Hukumeta Kurdistan li Bonn
Ji bona hemû Kurdên Welatperwer li Elemanya

Ligel vê Bagwaza hanê de em mujde bi we didin gihaştin, ku di dawîya pêrabûna kar û barekî pir ji bal Hukumet û Parlemana Kurdistan dikarîbû rezamendiya vekirina Biroyekê ji bona Pêwendiya Hukumeta me li Elmanya de bête wergirtin. Ev Birowa hanê mîna Baloz-xaneya Hukumeta Kurdistan li Elmanya tête dîtin. Ev Birowa hanê ya hemû Kurdekî dilsoz û Welatperwerekî ye, bê cudabûna bîr û bawerîyeke idyolocî ye.

Hemû Kurdek mafeyê rewaya wî heye, ku ew rûwê xwe ji bona vê Birowa hanê bide vekirin û ew wê bi ya xwe bide zanîn û daxwazên xwe têde bi ber çav bide xistin. Herwehajî ev Birowa hanê mîna pirekê di navbera Kurdên li Elmanya de dijîn û Hukumet û Parlemana Kurdistanê de dide pêkanîn. Erkê serekî vê Biroya hanê ye, ku ew Wêneretîya Gelê Kurdi-stana Iraqê li Elmanya de bide kirin, ya ku ew xwe îro di Parleman û Hukumetê de dibîne. Biryar. amojgarî û daxwazyîên wan li derve de cî bi çî bide kirin.
Ji vê dîtina hanê de em hewil didin, ku Bangewaza giringî Parlemana Kurdistan di roja 26. 1. 1993 de bi ber çavên we de bidin xistin.

Her weku li wê Bangewazîyê de hatîye, ku bar û doxên Kurdistanê sebaret bi Çardorlêgirtina Giştî ya Hevgirtina Netewan ji bona ser Iraqê û Çardorlêgirtina taybetîy û Rêjîma Bexdadê ji bona ser Kurdistanê de barekî Abrûyî pir îsext dayite durustkirin. Di demekê de ku Parleman û Hukumeta Kurdistanê bicgeh li Erkên xweyî Siyasî de erkê avedanî û geşkirina Kurdistanê, komek û xwedîkirina bi dehan Hezar ji Malên Şehîdan bi hustên wan ve hatine kevtin.
Me divê, ku em li dû vê Bangewazîya hanê de herin. Ji bona vê yeka hanê em daxwazê ji bona her Kurdekî Neştîmanperwer li Danişţvanên Elamanya dikin, da ku ew nardina yarme-tîyê ji bona Parleman û Hukumeta Kurdistanê bidin pelekirin.

Erkê Neştimanî, Netewayetî û Mirovayetî hemû Mirovekî Kurde li derve de ku ew yar-metîyeke Manganeyî li dûhev de ji bona ser Kontoyê Parlemana Kurdistan li Elemanya bide rêkirin.

Em rûwê xwe ber bi hemû Kurdekî li Elemanya de bê cudabûna barê Abûrîya wan didin vekirin. Çunge ev erkê Neştîmanîyî pîroz pêwiste, ku Kes lê bê beş neyête kirin. Bê gûman her Yek li gora karîna xweyî Abûrî de vê bide kirin. Diyare, ku Kurdên Dewlemend û Desthilatdar çûna wan di vî karî de çalaktir dibin.

Heger Lawên Kurd li derve de xem û derdên Gelê xweyî Bindest nexwin, yarmetîya Bê-ganeyî car bi car nikare gîr û girift birçîbûnê û serma çarese bike.

- كُتب [بالعربية] في آذار من عام ١٩٨٤

Shaoi

ونشر في مجلة "دراسات كردية"

التي يصدرها المعهد الكردي ~~عدد كانون الثاني ١٩٨٥~~

في باريس، تاريخ كانون الثاني ١٩٨٥